Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar : 392 nameronahi@gmail.com 08- Hezîran - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Bi zêdebûna germê re zehmetiyên koçberan jî zêdebûn





Bi zêdebûna germa havînê re zehmetiyên jiyanî yên koçberên kampa rojhilatê Minbicê zêde dibin. Koçberan diyar kirin ku çadirên lê dimînin, wan ne ji sermê û ne ji germê diparêze. Zehmetiyên koçberên kampa Minbic a rojhilat a li gundê Resim El-Exder bi hatina havînê re zêde dibin. Koçber dibêjin ku kon wan ji germaya havînê û sermaya zivistanê naparêze. Li gel van zehmetiyan jî rêxistinên peywendîdar û mafên mirovan çavên xwe li ber vê rewşê girtine.

Welatiyê koçber ê bi navê Ebdulbasit Mihemed ji bajaroka Meskenê ye, malbata wî ji 5 kesan pê tê wiha behsa zehmetiya dike: “Em ji ber germahiya zêde azaran dikşînin, ti amûrên sarkirinê li gel me tune ye . ji ber ku em bi rojî ne , em desmalan şil dikin û datînin ser serxên xwe”. Mihemed destnîşan kir ku, herî zêde zarok ji ber germahiyê bi nexweşiya leşmaniya dikevin. Mihemed bang li rêxistinên mirovî kir ku erka xwe pêk bînin û alîkariya koçberan bikin.

Welatiya bi navê Xewla Mihemed ji bajarokê Meskenê ye, ev bû saleke bi malbata xwe re li kampê dimîne û rastî gelek zehmetiyan hatiye. 2 keçên cêwî û kurê wê hene dibêje ku pêwîstiya zarokên wê bi şîr heye û banga şandina alîkariyan li rêxistinên mirovî kir.

Welatiya bi navê Fatma Hisên a ji bajaroka El-Mehdûmê ya dikeve başûrrojavayê Minbicê û li kampê dimîne diyar kir ku ji ber bilindbûna pileya germê pêşû pir bûne û di encamê de nexweşî jî belav dibin. Fatima destnîşan kir ku çavdêriya tenduristiyê li kampê tuneye ku rewşa nexweşan bişopînin.

Tevî ku Rêveberiya Minbicê bi derfetên kêm alîkariya koçberan dikin, lê ji ber êrîş û dorpêçê nikare daxwaza koçberan bi cih bîne...*ANHA*

# Welatî berê xwe didin Sûka El-Hêşe



Sûka El-Hêşe bi erzanbûna made û pêdiviyên xwe taybet e û yek ji bazarên sereke yên gelêrî li herêmê ye.

Sûka El-Hêşe ya gelêrî li gundewarê rojhilatê navçeya Eyn Îsa li aliyê rojhilatê bajaroka El-Hêşe dikeve. Welatiyên vê deverê li şûna ku berê xwe bidin navçeya Eyn Îsa û bajarê Girê Spî pêdiviyên xwe ji vê bazarê werdigirin.

Sûka El-Hêşe her duşem tê vekirin û welatiyên bi dehan gundên derdora bajaroka El-Hêşe berê xwe didin vê bazarê.

Sûka El-Hêşe bi erzanbûna made û pêdiviyên xwe taybet e û gelek welatiyên herêmê ji vir debara xwe werdigirin.

Di bazarê de pêdiviyên cûda yên xwarin û cilûbergan û pêwîstiyên malê û gelek alavên çandiniyê tên firotin.

Ji ber paşveçûna çandiniyê bi taybet di dema dagirkeriya çeteyên DAIŞ’ê de gelek welatiyên herêmê neçar man di van bazarên gelêrî de bixebitin da ku debara malbatên xwe werbigirin.

Firoşkarê bi navê Ehmed Ebû Zehra diyar kir ku piştî paşveçûna rewşa çandiniyê ew neçar ma di bazarê de karekî ji xwe re peyda bike û debara malbata xwe werbigire. Ebû Zehra destnîşan kir ku Sûka El-Hêşe heftane carekê di roja duşemê de vedibe.

Welatiyê bi navê Mehmûd Îyade ku ji Dêrazorê koçber bûye da zanîn ku li gorî bazarên di bajaran de buhaya pêdiviyan di vê sûkê de erzan in...*ANHA*



# Parkên Eyn Îsa wê ji nûve geş bibin



Şaredariya Gel a Eyn Îsa bi armanca careke din daran lê biçîne, dest bi paqijkirina parkan kir. Di xebatên paqijiyê de 35 karker dixebitin.

Komîteya Xizmetguzariyan a Şaredariya Gel a Navçeya Eyn Îsa dest bi hemleya paqijkirina parkên navçeyê kir. Di navçeyê de 4 park hene, di dema çeteyên DAIŞ’ê de hemû park hatin xirakirin.

Komîte piştî parkan bi temamî paqij bikin, dê daran di wan de biçînin. Di xebatên paqijkirinê de 35 karker dixebitin. Tê payîn ku di dawiya meha Remezanê de dar di parkan de werin çandin. Derbarê mijarê de karkera bi navê Ferîda Mihemed diyar kir ku ew parkan ji çopê paqij dikin da ku di demên pêş de daran di wan de biçînin.

Hevseroka Komîteya Xizmetguzariyê Xedra Ebûd derbarê mijarê de da zanîn ku armanca wan ew e ku rengê kesk ku ji beriya çend salan li herêmê nemaye vegerînin...*ANHA*

# Embar li benda genim in



Karîgeriya Çandiniyê ya girêdayî Komîteya Aborî ya Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a herêma Tebqayê tedbîrên pêwîst ji bo jinûve vekirina embarxaneyên El-Sehlebiyê wergirtin da ku pêşwaziya genim a îsal bike.

Embarên El-Sehlebiyê 30 km rojhilatê bajarê Tebqayê ye û 10 şaneyên wê yên embarkirinê hene û du şaneyên din jî ji bo lihevxistina hilberînê hatine veqetandin. Her şaneyeke embarkirinê 1200 ton hilberîn werdigire.

Di derbarê rêbazên wergirtina hilberînê de Endamê Rêveberiya Karîgeriya Çandiniyê ya Tebqayê Mihemed El-Mehmûd diyar kir ku ew di destpêkê de hilberîna cotkaran lêkolîn dikin û li gorî wê buhaya hilberîn tê dayîn. El-Mehmûd diyar kir ku ew rêjeya yekemîn a hilberînê bi 175 lîreyên Sûriyê ji bo kîloyeke genim werdigirin.

El-Mehmûd texmîn kir ku ew dê nêzî 50 hezar ton hilberîna genim îsal werbigirin. Ev rêje jî gelekî kêm e bi taybet ji ber ku hikûmeta Tirk herikîna ava çemê Firatê biriye û vê yekê bandoreke neyînî li hilberîna îsal kir. Her wiha kêmbûna baranê di zivistanê de û lehiyên baranê di demsala buharê de pirsgirêk mezintir kir...*ANHA*




## Li dijî dagirkeriyê ‘Eniya Neteweyî’ hate avakirin



Nerazîbûna li dijî êrîşên dewleta Tirk ên li ser Başûrê Kurdistanê zêde dibe. Gelek aktîvîst, alimên olî, parlamenter û nûnerên rêxistinên civakî yên sivîl li Hola Emnesoreke ya Silêmanî li hev civiyan û li dijî dagirkeriya Tirk ‘Eniya Neteweyî’ ava kirin. *R-5*


## Dagirkeriya Tirkiyê nayê qebûlkirin

Kongreya Netewî ya Kurdistanê KNK’ê têkildarî dagirkeriya Tirkiyê ya li ser Başûrê Kurdistanê daxuyaniyeke nivîskî weşand û diyar kir ku Erdogan, piştî dagîrîya Efrînê ‘Operasyona Qendîlê’ ji bo xwe kiriye parolaya serkeftina hilbijartinên 24’ê Hezîranê. KNK’ê got, “divê xelkê Bakurê Kurdistanê di 24’ê Hezîranê de derseke mezin bidin Erdogan û desthilata wan hilweşînin.” *R-4*



Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 392 08- Hezîran - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Pêdivî bi kongreyeke netewî ya Sûriyê heye



Eniya Demokratîk a Sûriyê ya Opozisyonê Hevserok û endamên Meclîsa Zagonsaz a kantona Cizîrê re hevdîtin pêk anîn. Di hevdîtinê de aloziya Sûriyê hat nirxandin û ji bo çareserkirina aloziya Sûriyê hat gotin ku divê gelên Sûriyê li paytexta Sûriyê Şamê li hevdû rûnin û nîqaş bikin. Her wiha hat destnîşan kirin ku pêdivî bi lidarxistina Kongreyeke Niştîmanî ya Sûriyê heye. *R-5*

# ÊZIDİYAN JI QIRKIRINÊ BIPARÊZIN



### DIVÊ MIROVAHÎ ÊZIDIYAN BIPARÊZE

Dewleta Tirk ya dagirker û çeteyên wê piştî ku Efrîn dagirkirin yek ser dest bi qirkirin û paqijiya etnîkî kirin. Cihên dîrokî yên herêmê rûxandin û sazî hilweşandin û demografya herêmê diguherînin. Bi taybet cih û deverên pîroz yên Êzidiyên Efrînê jî wêran kirin. Yekîtiya Êzidiyên Efrînê li Kampa Serdemê ya li Şehbayê daxuyaniyek dan û bang li civaka navnetewî û rêxistinên Mafên Mirovan kirin ku destwerdanê li Efrînê bikin û Êzidiya ji qirkirinê biparêzin.

### LI EFRÎNÊ QIRKIRINA ÊZIDIYAN TÊ KIRIN


Di daxuyaniyê de wiha hat gotin, “Bi sedan salane ola Êzdiyan rastî êrîşên tunekirinê tê. Cara yekê ye ku bi destpêkirina aloziya Sûriyê re ku li herêmên Kurdan Rêveberiya Xweseriya Demokratîk hate damezrandin hebûna Êzdiyan û ola Êzidî tê nas kirin. Li ser vê yekê Êzidiyan xwe bi rêxistin kirin û saziyên xwe vekirin. Lê piştî dagirkirina Efrînê Artêşa Tirk û çeteyên wê êrîşî cihên Êzidiyan kirin û dest bi qirkirinê kirin.”*R-2*

## Tirkiye dixwaze careke din Minbicê bide terorîstan



Hevserokê Meclîsa Zagonsaz a Minbicê û Şêxê Eşîra El-Bobena Farûq El-Maşî diyar kir ku dewleta Tirk dixwaze li Sûriyê careke desthilatdariya Osmanî ava bike û da zanîn ku dagirkirina Efrînê mînaka vê yekê ye. El Maşî got, “Dema ku çeteyên DAIŞ’ê Minbic dagir kirin û komkujî pêk anîn dewleta Tirk bê deng bû lê niha gefan dixwe. Divê civaka navnetewî li dijî vê êrîşkariya dewleta Tirk derkeve.” *R-4*

## Minbicî wê derbarê xwe de biryar bidin



Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Minbic û Gundewarên wê derbarê pêşketinên dawî yên derbarê Minbicê de civînek lidar xist. Di civînê de Endamê Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Minbicê û Gundewarên wê Ferhad Şiblî axivî û got, “Lihevkirinên ku têne kirin rewşa Minbicê naguhere, wê hemû biryarên di derbarê Minbicê de rêveberiya Minbicê bide.” *R-4*

## Em amade ne biçin Şamê




Endamê Desteya Rêveber a Meclîsa Sûriya Demokratîk MSD’ê Hikmet Hebîb anî ziman ku ew amade ne ji bo çareseriya aloziya li Sûriyê biçin Şamê. Hebîb wiha got, “”Em her tim ji danûstandinên siyasî re amade ne. Projeya me ya niştîmanî heye û em dikarin li ser esasê wê projeyê bi her kesî re nîqaş bikin.” *R-4*

## Leşker û polîsên di destê PKKê de bang kirin

*R-5*





## Zeyneb Celaliyan hişyar kir



Girtiya siyasî ya Kurd Zeyneb Celaliyan ku ji sala 2007’an de li zîndanên rêjîma Îranê girtiye tendurustiya wê her diçe xirab dibe. Zeyneb Celaliyan rayedarên girtîgehê hişyar kir û diyar kir ku ger ku heya roja Şemiyê wê neşînin nexweşxaneyê, wê nerazîbûnek cûda nîşan bide. *R-3*

## Koalîsyona navdewletî serdana Minbicê kir

Şandeyek Koalîsyona Navdewletî çû Minbicê serdana navenda Rêveberiya Sivîl a Demokratîk ya Minbicê kirin. Hat ragihandin di civînê de mijara Itîfaqa di navbera Amarîka û Tirkiyê ya li ser Minbicê hatiye nîqaş kirin. *R-2*

## Gerîla derbên giran li artêşa Tirk da

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG’ê diyar kir ku gerîla li Colemêrg û Başûrê Kurdistanê çalakî kirine. Di çalakiyên 6-7’ê Hezîranê ya li sê nuqteyên cuda de, 6 leşkerên artêşa Tirk ya dagirker hatine kuştin. *R-2*

## Em ê aramiya li herêma xwe biparêzin



Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Minbicê bi daxuyaniyekê diyar kir ku rêjîma Tirk bi gefên xwe yên li dijî Minbicê hewl dide aramî û ewlehiya li Minbicê, jiyana hevbeş û biratiya gelan têk bibe û got, “Emê aramiya li herêma xwe biparêzin.” Rêveberiyê got, “Gelê Minbicê xwe bi rêve dibe û pêdiviya Minbicê bi destwerdan û fermanên derve tune ye.” *R-2*

# Dixwazin Êzidîyên li Efrînê qir bikin

***Dewleta Tirk ya dagirker û çeteyên wê piştî ku Efrîn dagirkirin yek ser dest bi qirkirin û paqijiya etnîkî kirin. Cihên dîrokî yên herêmê rûxandin û sazî hilweşandin û demografya herêmê diguherînin. Bi taybet cih û deverên pîroz yên Êzidiyên Efrînê jî wêran kirin.***

Yekîtiya Êzidîyan a Efrînê kiryarên aratêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê li ser gund, cih û navendên olî yên Êzidîyan şermerzar kirin. Êzidiyan bang li civaka navdewletî kirin ku li hember qirkirina civaka Êzidî helwestên xwe diyar bikin.
Yekîtiya Êzidîyan derbarê êrîşên artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê li dijî Êzidîyên Efrînê daxuyaniyek dan. Daxuyanî li kampa Serdemê ya herêma Şehbayê ji aliyê Endamê yekîtiyê Esed Marok ve hate xwendin. Bi dehan şêniyên herêmê tevlî xwendina daxuyaniyê bûn.
Daxuyanî wiha ye:"Bi sedan salane ola Êzdiyan rastî êrîşên tunekirinê tê. êrîşa herî dijwar a ji bo tunekirina ola Êzdiyan di serdema dagirkeriya Osmaniyan de bû. Mayîna ola Êzdî tê wetaya berdewama berxwedana li dijî dagirkeriyê. Ola Êzidî weke her tim bû hedefa dijminên gelê Kurd. Ji destpêka aloziya Sûriyê ya sala 2011'an ve û piştî valahiya rêveberî ya li herêmên Kurdî, Rêveberiya Xweseriya Demokratîk hate damezrandin ku cara yekemîn hebûna Êzdiyan û ola Êzidî nas dike. Welatiyên Êzidî bi vê yekê dest bi damezrandina komeleyên xwe yên Êzidî kirin û bi armanca perwerdekirina zarok û ciwanên xwe li ser bingehên rê û resmên ola Êzidî li gelek gundan dibistanên xwe vekirin.Bi destpêkirina êrîşa artêşa Tirk a dagirker li dijî herêma Efrînê komên çete yên girêdayî wê gefên kuştin û serjêkirinê li



welatiyên Êzidî xwarin. Van komên çete eşkere radigihandin ku tişta li Şengalê dest pê kirine dê li Efrînê berdewam bikin. Çeteyan hemû mezar û deverên pîroz ên Êzidiyan li Efrînê teqandin û welatiyên Êzidî neçarî koçberiyê kirin û gelek ji welatiyên Êzidî neçar dikirin ku dest ji ola xwe berdin û beşdarî ola Îslamî bibin. Her wiha komên çete cilûbergên taybet bi aliyên îslamî yên radîkal li ser jinên Êzidî ferz kirin û li şûna çanda biratî û jiyana hevbeş çanda îslamiya radîkal belav dikin."Yekîtiya Êzdiyan destnîşan kir ku revandina ciwanên Êzidî ji aliyên komên çete ve ji destpêka dagirkeriya artêşa Tirk a dagirker û komên çete yên girêdayî wê li herêma Efrînê bi awayekî rojane berdewam dike. Ciwanên Êzidî yên tên revandin rastî îşkenceyên dijwar tên. Her wiha bi hemû rêbazan hovîtiya xwe li ser welatiyan didin meşandin û mizgeftên xwe li gundên Êzidî ava dikin."Em weke Yekîtiya Êzdiyan bang li civaka navnetewî û rêxistinên Mafên Mirovan dikin ku destwerdanê li Efrînê bikin û pêkhateya Êzidî ji qirkirinê biparêzin û rê li pêşiya kînên komên cîhadîst û dewleta Tirk bigirin."

## Em ê aramiya li herêma xwe biparêzin



Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Minbicê bi daxuyaniyekê diyar kir ku rêjîma Tirkiyê bi riya van gefên xwe yên li dijî Minbicê hewl dide aramî û ewlehiya li Minbicê û jiyana hevbeş û biratiya gelan têk bibe û got, "Emê aramiya li herêma xwe biparêzin."
Girêdayî pêşketinên dawî yên li Minbicê de, Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a herêma Minbicê daxuyaniyek da.
Daxuyanî ji aliyê hevserokê Meclîsa Rêveber a Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Minbicê Mihemed Xêr El-Şêxo ve li pêşiya avahiya rêveberiyê bi amadebûna endamên rêveberiyê, komîn û meclîsên herêmê hate xwendin.
Daxuyaniya Rêveberiyê wiha ye: "Aramî û ewlehiya ku welatiyên me li Minbicê û gundewarê wê dijîn, ne li gorî berjewendiyên Osmaniyên Tirk in ku hewl didin axa Sûriyê dagir bikin.
Meclîsa Leşkerî ya Minbicê hêza tekane ye ku nûnertiya welatiyên bajarê Minbicê û gundewarê û hemû pêkhateyên wê dike û erka wê ye ku herêma xwe ji hemû êrîş û destdirêjiyan biparêzin. Ji ber ku ew nûnerê welatiyên Minbicê ye herêm ji destên çeteyên DAIŞ'ê ku alîkariya xwe ji Tirkiyê werdigirtin rizgar kirin û di vê derbarê de bi sedan şehîdên weke Feysel Ebû Leyla, Ednan Ebû Emced, Ebû Casim El-Begarî û Botan Turkmen dan.
Rêveberiya Sivîl a Demokratîk beriya ku hemleya rizgarkirina Minbicê dest pê bike hate damezrandin û rizgarkirina bajêr bi alîkariya welatiyên wê hate meşandin. Niha jî ew dikare rêveberiya Minbicê bike ji ber ku di dema borî de piştî hate rizgarkirin xebatên xwe bi riya meclîs û komîteyên cûda bi rêk û pêk meşandin. Pêdiviya welatiyên bajêr bi destwerdan û fermanên derve tune ye.
Divê dewleta Tirk ji van herêmên ku dagirkirine derbikeve û rê li pêşiya welatiyên van herêman were vekirin da ku xwe bi rêve bibin.
Em daxuyanî û gefxwarinên rêjîma Tirkiyê qebûl nakin.
Rêjîma Tirkiyê bi van helwestên xwe hewl dide aramî û ewlehiya li Minbicê têk bibe û jiyana hevbeş û biratiya gelan li herêmê hilweşîne.
Em weke Rêveberiya Sivîl a Demokratîk em ê parastina aramî û ewlehiya li herêmê berdewam bikin û rewşa xizmetguzarî û jiyana hevbeş li herêmê pêş bixînin. Her wiha li ser bingeha edaleta civakî û beşdarbûna piralî derfet dê bêne peydakirin.
Meclîsa Leşkerî ya Minbicê hêza tekane ye ku parastina ewlehiya welatiyan dike. Em bang li hemû welatiyên Minbicê yên penaber bûne dikin ku vegerin bajarê xwe û li ser bingeha hezkirin, aştî, geşbûn, ewlehî û aramiya hemûyan beşdarî avakirina herêma xwe bibin."

## Koalîsyona navdewletî serdana Minbicê kir



Şandeyek Koalîsyona Navdewletî li nava kolanên Minbicê geriyan û paşê serdana navenda Rêveberiya Sivîl a Minbicê kirin û mijara Itîfaqa di navbera Amarîka û Tirkiyê bi wan re nîqaş kirin.
Şandeya Kaolîsyona Navdewletî ji General James Grad, Captain Will, Sefîrê berê yê Dewletên Yekbûyî yên Amarîka li Erebistana Siûdiyê William Roubak pêk dihat. Hevserokê Komîteya Hindirîn a Minbicê Ebid Mustefa û Hevserokê Komîteya Têkiliyên Civakî Adil Ebdulselam jî bi şandeyê re li nava kolanên Minbicê geriyan.
Serdana şandeya Koalîsyonê di deme ku çavê hemû kesî li ser Minbicê bû û bi taybet piştî itîfaqa du alî ya di navbera wezîrên karê derve yên Amarîka û Tirkiyê de roja duşemê li Washongton pêk hatiye. Hate gotin ku herdû aliyan derbarê Minbicê lihev kirine.
Piştî şande li kolanên Minbicê geriyan, berê xwe dan avahiya Rêveberiya Sivîl a Demorkatîk a Minbicê û bi rêveberiya wê û endamên komîteyan , her wiha bi meclîsên xetan re bi awayekî ji çapemeniyê re girtî civiyan.
Hat ragihandin ku armanca civînê ew e ku Amarîka xalên iîtfaqa Amarîka û Tirkiyê ya derbarê Minbicê de ji wan re raber bike…*ANHA*

## Gerîla derbên giran li artêşa Tirk da



Gerîlayên HPG'ê li Şemzînan, Çelê, Kerboran, Barzan û Semsûr li dijî leşkerên Tirk çalakiyên xurt lidar xistin. Di van çalakiyan de herî kêm 6 leşker hatin kuştin.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê diyar kir ku di çarçoveya 'Pêngavên Şoreşgerî ya Şehîd Pîroz û Şehîd Agirî' de li Colemêrg û Başûrê Kurdistanê çalakî kirine. Di çalakiyên 6-7'ê Hezîranê ya li sê nuqteyên cuda de, 6 leşker hatine kuştin.
Agahiyên têkildarî çalakiyên li Colemêrg û Barzan wiha ne: "Hêzên Me di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Pîroz û Şehîd Agirî de li dijî hêzên dagirker çalakiyên xurt didomînin. Di vê çarçoveyê de 6'ê Hezîranê hêzên me di saet 16:00'an de li dijî leşkerên li devera Maata ya li devera Govendê ya girêdayî navçeya Şemzînan a Colemêrgê çalakiyek lidar xistin. Di vê çalakiya bi awayek xurt li çeperên dijmin hate xistin de bi qasî hate zelalkirin leşkerek hate kuştin, leşkerek jî birîndar bûye.
Hêzên me 6'ê Hezîranê saet 18:00'an, li dijî leşkerên li Girê Merganiş a girêdayî navçeya Çelê ya Colemêrgê çalakiyek lidar xistin. Di vê çalakiya li çeper û kozikên dijmin hate xistin de, di vê çalakiyê de bi qasî hate zelalkirin 4 leşker hatin kuştin.
7'ê Hezîranê saet 06:30'an, hêzên me li dijî leşkerên li Girê Bayrak ê girêdayî herêma Bradost a Başûrê Kurdistanê çalakiyeke ya sekvaniyê liar xistiye. Di vê çalakiyê de leşkerek hatiye kuştin.

## Artêşa Tirk êrîşî Girê Spî kir

Şevê 7'ê Hezîranê deriyê sînor ê Girê Spî rastî êrîşeke bi çekên giran ji aliyê artêşa Tirkiyê ve hat.
Artêşa dagirker a Tirk ji nuqteyên xwe yên sînor bi şev saet di 23:00'an de bi çekên giran êrîşî deriyê sînor ê Girê Spî kir. Êrîşa artêşa Tirk heta derengiya şevê dom kir.
Li gor nûçegîhanên ANHA'yê di encama êrîşa artêşa Tirk de tenê ziyanên madî çêbûne.
Girêdayî mijarê şervanê Hêzên Erka Xweparastinê Elî Îbrahîm diyar kir ku ew di dema êrîşê de li devera deriyê sînor dima û wiha got: "Artêşa Tirk bê navber devera deriyê sînor bi çekên giran heta derengiya şevê armanc girt."
Elî Îbrahîm got ku wan ti bersiva



êrîşan nedane û tenê guleyekî jî bi aliyê Tirkiyê ve neavêtine.
Girêdayî heman mijarê welatiyê bi navê Seîd El-Fehil ku mala wî li devera deriyê sînor e diyar kur ku artêşa Tirk hewl dide tirs û xofê bixe dilê welatiyan da ku neçarî koçberiyê bike û wiha got, "Em ti carî dest ji malên xwe bernadin. Hovîtiya Tirkiyê israra me di mayîna di bajêr de zêde dike."…*ANHA*



# Zarokên Mexmûrê amadekariya mîhrîcanê dikin

***Li Wargeha Şehîd Rûstem Cûdî ji aliyê Navenda Çand û Hunerê ya Mexmûrê (NÇHM) ve cara yekemîn ji 1'ê Tîrmehê heta 3'ê Tirmeh'ê ji bo zarokên penaber wê mîhrîcan were lidarxistin. Mamosteya muzîkê Sidar Yeman got: " Armanca me ew e ku em ji her aliyê Kurdistanê ve zarokên Kurd bînin gel hev."***



Li Wargeha Şehîd Rûstem Cûdî (Mexmûr) ji aliyê NÇHM'ê ve yekemîn car di roja 1-3'ê Tirmeh'ê de ji bo zarokan wê mîhrîcan were lidarxistin.

Li Wargeha Şehîd Rûstem Cûdî ji aliyê Navenda Çand û Hunerê ya Mexmûrê (NÇHM) ve cara yekemîn ji 1'ê Tîrmehê heta 3'ê Tirmeh'ê ji bo zarokên penaber wê mîhrîcan were lidarxistin. Ji bo amedekariyên mîhrîcanê bê navber zarokên wargehê bi kelacanek pir mezin xwe ji bo mîhrîcanê amede dikin. Beşên di mîhrîcanê de cih digirin wekî; muzîk, foklor, şanoyê ne. Wê ji her aliyê Kurdistanê ve zarok tevlî mîhrîcanê bibin.

### BILA ZAROK JIYANÊ NAS BIKIN


Mamosteya bi navê Sidar Yeman a perwerdeya muzîkê dide zarokan di derbarê kar û xebatên didin meşandin de wiha got: "Armanca me ya lidarxistina vê mihrîcanê ew e ku em ji her aliyê Kurdistanê ve zarokên Kurd bînin gel hev û jiyanê bi her rengî nas bikin. Dîsa em dixwazin ku berhemên zarokên Mexmûrê yên penaber, ji aliyê zarokên din ve jî bê dîtin û zarok ji hev feyzê bigirin. "

### ZAROKÊN AFRÎNER

Sîdarê di berdewamiya axaftina xwede bal kişand ser delalî û zîrekiya zarokan û wiha pê de çû: " Tevî zor û zehmetiyên ku penaber dibînin jî dîsa zarok xwedî taybetmendiyek hunerî û afirîner in. Ji bo dîtina berhemên zarokên penaber em hêvî dikin ku zarokên ji her parçeyên Kurdistanê tevlî mîhrîcanê bibin. Ji bo vê mîhrîcanê jî zarok bi kelecanî û coşek mezin tevlî xebatên amadekariyê dibin."

Her wiha mamoste Medya Yeman jî anî ziman ku zarok siberoj e divê mirov li siberoja xwe xwedî derkevin û bang li hemû welatiyên li Kurdistanê dijîn kir ku bi awayekî xurt tevlî mîhrîcana zarokan bibin. Medyayê bi taybet bang li zarokên bajarên Başûrê Kurdistanê yên Hewlêr, Kerkuk, Şengal û Silêmanî dîsa tevahî zarokên Rojavayê Kurdistan kir kû tevlî mîhrîcanê bibin… *JINNEWS*

## Hêvana hunerê



**Xelîl XEMGÎN**

Di van bîst salên dawiyê de, rewşa çand û hunera kurdî, di trajediya xwe ya herî giran re derbas dibe! Bîst sal in, her ku diçe, gengeşî û nirxandinên der barê çand û hunerê de, erka ronîkirin û pêşîvekirinê 'mîna ku ne pêwîst be' ji rojevê hat derxistin. Ji bîra siyasetmedar, rewşenbîr, civaknas, nivîskar û hemû babetên çapemenî û ragihandina kurdan, êdî hatiye derketiye!

Di serdema teknolojî û hayedariya însan de, pêwîst bû herî zêde civakên mîna civaka me, ku di bin gefên qirkirina çandî de rû bi rû ne, sûd ji vê serdema şoreşa teknolojî bistîne û feraseta van derfeta, ji civaka xwe re, veke derfetek pêşxistinê bibîne. Lê mixabin, îroj mirov vê rastiyê gelekî zelal dibîne ku hişmendiya serdest a kurdan, di pratikê de, mijara çand û hunerê hem biçûk dîtiye, hem jî, di helwesta xwe de lewaz û bê berpirsyarî maye!...

Bîst sal e (!) hîn pel û gupikên vejînê çand û hunerek hezar salan, bi kelecana raperîn û serlêdana vî gelê fedekar, şax û kulîlkên xwe nû vedikirin!.. Mîna her babetên tekoşînê, ji tunebûnê, ji bê derfetiyê, nezanbûn û bê ezmûniyê, çirûskên hebûnê diafirandin. Zimanên lal û guhên jar vedikirin. Gelo çi bû, bi rastî çand û hunerê ev rewşa heqkiribû? Çima her herkes vê pirsgirêka man û nemanê piştguh dikin?

Gelo çima her kes xwe bi nirxên serdema salên 80-90 tatmîn dikin û wilo erzan erzan xerc dikin?... Ma êdî di serdema teknolojiya, serdema tevnên civakî û babetên dijîtalî de ku cîhana mirovahiyê bi qedera gundekî biçûkkirî, êdî pêdviya civaka me, netewa me bi çand û hunerê tune ye?

Rastiyekê baş dizanim û dixwazim bi we re parve bikim! bîrkirin û (xwezî bi wan serdeman) bi kelecana salên 80 û 90'î. Ji aliyekî ve hinceta reva ji çareserkirina pirsgirêkên xitimandin û tevizandinê ye.

Bi baweriya min, ji dêvla heyfkirin û " xweziyan " heger meriv nirxên wan salên giran û zehmet biparasta û biparêze, hîn rast û watedartir e.

Îro, ango dema pergala serdest (bi çi armanca ideolojîk dibe, bila bibe) populer û hunermendên pergala xwe, di asta şowê de, li ser tixûpên Efrînê, peyaman dide civaka xwe, di heman demê de, peyama astek nû ji fermana qirkirina çandî aşkera dike. Rast e, ew eniya dijber e, lê belê ma ne pêwîst e, em li eniya xwe, li asta qadên çand û hunerê mêze bikin?

Bi rastî berhêneyek, tedbîr û plansaziyek van qadên girîng, di 20 salên bihurî de, bi cidiyet pêk hatin? Ji bilî rexne û dîsa rexne, ji otorîteya siyasî heya sazî û dezgehên neteweyî, ji qada ronakbîrî, ta ragihandin û aktîvîstên çand û hunerê, ji bilî rexekirin û gazinan, perspektîfek an nexşerêyek ku bikaribe ev qadên hunerê ji nû ve zindî û aktîf bike, sed mixabin, derneket holê.

Xwendevanên hêja, êdî dizanim ku xwendevan gotarên nivîs dirêj, zehmetiya xwendinê di xwe de nabînin. Derbarê mijarên çand û hunerê de, êdî bi kurtenivîsan, em ê bi hev re bin…*Jêder-e-rojname*

## Avakirina estetîkê di hunerên performansê de



**Loqman GULDIVÊ**

Bikaranîna kemaçe û dar û şiva kemaçê jî ez li vir li der ve bihêlim û bibêjim, lêkolînên berfireh ên avakirina kulîsan û avakirina estetîkê bi xwe di nav hunerên performansê ên gelêrî de lazim in, da ku ev hunerên hanê karibin dewam bikin

Kulîsên ku performansên gelêrî dikin performansên gelêrî,


mijarek in ku daketina bi wan êdî zehmet û qismî jî derengmayî be; lê belê dikarin ji nû ve peyde bibin û rêûresmeke nû ya hunerî muhtemel e bi cîh bibe. Di civakan de huner û cihê hunerê, elaqedarî asta qîmetpêdana civakî û siyasî ye, ji ber wê jî ev jinûve peydebûn wê girêdayî vê qîmetpêdanê be.

Li Japonya û Çînê rêûresmên bi heman rengî bi berfirehî bûne mijarên lêkolînên ilmî û gotarên hunerî. Li nav kurdan tevî ku gotareke elaqedarî dengbêjiyê weke hunerekî performansê derketibe pêş jî, di nav peyvê de zelûlkirina gelek performansên gelêrî yên zargotinê û derneketina ji nav gotara siyasî, pêdaketina kite bi kite ya alî û beşên van huneran talî kiriye. Ango li ber destê me analîzeke berfireh a avakirina kulîsan di hunerên performansê yên gelêrî de nîn e; em ji estetîka bi van kulîsan tên avakirin û peywendî û gihiştina di hev a performer (kesê performansê pêşkêş dike) û audience (guhdar û temaşevan) bi awayekî ilmî nas nakin. Ji ber wê jî li ber destê me ew dane nînin ka ev huner ji nû ve bên avakirin, wê xwe bispêrin kîjan pîvanên estetîkê. Ango fêmkirina herî besîd a ilmî jî li ber destê me nîne.

Ji bo fêmkirina meseleyê ya muhim ez bi nimûneyekê behsa meseleyê bikim. Ez ê vegerim ser wan performerên kemaçeyê ku destanên epîk ên bi navê "şer" digotin (ez piştrast nîn im ka gelo hîna ên ku li odeyan wan dibêjin mane yan na). Gava mirov berê xwe dide vê performansê tiştên sereke ber dest mekan (mînak, odeya gund, bi rengekî ji rengan mekanekî gelemperî yan jî giştî), performer (şerbêjê kemaçevan) û civata guhdaran heye. Di peywenda ji rêûresmê de mekan, mekanekî ji vê performansê re veqetandiye, ango hem ji performer re û hem jî ji civata guhdaran re eyan e ku ev mekan yek ji mekanên muhtemel ên vê performansê ye. Ji ber wê jî bi guncawbûna mekan hem civakî, hem huner û hem jî di warê estetîkê de tê zanîn. Performer jî tevî ku xwedî azadiyeke afirandina hunerî ye, hem di warê performansê de, hem di warê kulîsên wê yên deng, reng û şanogeriyê de û hem jî di warê repertuwarê de bi sînorên xwe dizane, wan sînor hem qebûl dike, hem jî ji bo performansên paşê her ji nû ve ava dike. Di heman çarçoveyê de civata guhdaran a berdest jî ne civateke pasîv e, civateke ku bi deng, heyênî û nîdayên cuda yekser midaxilî performansê dibe, heta qismî be jî kulîsan bi performer re ava dike, tewêniyan dide, nîdayên hevaheng ji xwe dide der û amade ye, heger perfor ji sînorên xwe di warê performansê, naverokê yan jî repertuwarê de bibihure, dest werde wî.

Ji ber wê jî kulîsên performansê di estetîka giştî ya şerbêjiyekê de diyarker in. Em bi mînakeke Bedranê Mala Alê û performansa wî ya Cembelî ku tenê weke kaset li ber destê min e, vê yekê piçekî darî çav bikin. Bedran beriya her tiştî estetîka xwe li ser bikaranîna deng, guhertina awayê vegotinê û înteraktîfkirina performansê ava dike. Di nav van kulîsan de weke li derveyî amûra muzîkê bikaranîna kemaçe û şiva kemaçê jî heye. Bedran veguherîna di navbera gotina "çîrokî" û "stranî" bi hostetiyeke welê dike ku kemaçe jî pêre pêre dibe gunehkarê serketina wî. Rîtmeke veşartî ber bi dawiya hevokên beşa çîrokî ve, civata guhdaran amade dike ku bi baldarî guh bidin kemaçe û beşa stranê. Bi heman rengî ber bi dawiya beşa stranî ve bikaranîna deng û qirikê û helbet hemahengiya bi kemaçê re guhdaran ji guhertinê re amade dike. Di vê performansê de Bedran her wekî Reşîdo awayekî taybet ê rîtmîk ê gotinê jî bi kar tîne ku ne çîrokî ye û ne stranî ye jî weke adetê. Dema tevgereke diyar di vegotina performansê de dide der weke gefxwarinê, weke şer û weke bûyereke ku tevahiya konstelasyona heyî serûbinî hev dikin, hingê ev awayê vegotina rîtmîk guhdaran amade dike yan jî bi estetîkê bi guhdaran vê guherîna rewşê dide hisandin. Bikaranîna kemaçe û dar û şiva kemaçê jî ez li vir li der ve bihêlim û bibêjim, lêkolînên berfireh ên avakirina kulîsan û avakirina estetîkê bi xwe di nava hunerên performansê ên gelêrî de lazim in, da ku ev hunerên hanê karibin dewam bikin û karibin kurdbûnê ango xwebûna civaka kurd jî qehîm bikin…*Jêder-e-rojname*

## Netew bi çanda xwe tên naskirin



Jinên Rojavayê Kurdistanê çanda xwe ya kevnar ku heta vê demê anîne diparêzin û dibêjin ku çanda mirovan nasmeya neteweyîbûnê ye û divê ev nasname di destpêkê de ji aliyê jinan ve bê parastin.

Jinên Hesekê yên Rojavayê Kurdistanê parastina çanda xwe wekî erkek pîroz a li ser milên xwe dîtine û heta niha parastine.

Şukriya Hec Enter a ku genim di cir de dikute, anî ziman ku ew bi saya keda dayika xwe hînî parastina çanda xwe ya kevnar bûye û got: "Ev karê ku ez dikim ji bo min gelek bi wate ye. Lewra ez çanda xwe ya kevnar bi vî awayî diparêzim û bi bîr dixim. Ev erka li ser milê me hemûyan e divê em hemû bi taybet jî jin li keda xwe û çanda xwe xwedî derkevin."Jina bi navê Gutna Hec Ehmed ku hiriyê bi teşiyê dirêse got: "Ez ji zarokatî de hiriyê bi teşiyê dirêsim. Vê çanda xwe ya kevnar bi kedeke mezin diparêzim ku çanda me winda nebe. Ji bo min karê destan û keda destan gelek pîroz e. Ji bo siberojek azad divê em li çanda xwe xwedî derkevin. Çanda mirovan nasmeya neteweyîbûnê ye û divê ev nasname di destpêkê de ji aliyê jinan ve bê parastin."…*Ronîda HACÎ/Hesekê*


# Li Şehbayê projeyên aborî

***Ji ber sedema êrîşên dagirkeriyê yên dewleta Tirk û çeteyên wê gelê Efrînê neçar ma ji Efrînê derkeve û li Şehbayê bi cih bibe. Bi armanca piştgiriyê Komîteya Aborî ya herêma Efrînê ji bo Efrîniyên li Şehbayê projeyên aborî pêş dixe.***

Komîteya Aborî ya herêma Efrînê bi armanca destekdayîna ji bo100 malabtên Efrînî yên li Şehbayê re 28 projeyên aborî amade kiriye. Komîte her wiha ji bo vekirina kargeha qeşayê amadekariyan dike.
Bi êrîşên Artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wî yên li ser Efrînê re, şêniyên Efrînê neçar man ji warê xwe derkevin û li kantona Şehbayê bi cih bibin. Komîteya Aborî ya herêma Efrînê bi armanca destekdayînê bi şêniyên Efrînê re, hejmareke proje dane destpêkirin.
Komîteya Aborî ya Efrînê ku ji 5 endaman, 2 ji Efrînê û 3 ji şehbayê pêk tê 10'ê Gulanê xebatên xwe dane destpêkirin. Komîteyê heta niha di nav 20 rojan de 20 daxwaznameyên projeyên aborî ji welatiyên Efrînê girtiye.
Proje ev in: vekirina dikanên firotina zebze û meywe, madeyên sotemeniyê, madeyên xwarinê, firotina cilan, firina hevîrgoştê, dikana sermîsankgeh, dikana şûştina û ûtîkirina cilan, dikana hesinkariyê û du kefîtîrî. Her wiha komîteya Aborî ji bo firehkirina dermanxaneyekê alîkarî daye.
Li gorî rayedarên Komîteyê piraniya projeyan dê li navçeyên Til-Rifet, gundên Fafîn, Til Qerah û Um El-Hoş werin vekirin.
Piştî nirxandina daxwaznemayan, Komîte li gorî derfetên Rêveberiya Xweser alîkariya madî ji welatiyan re pêşkeş dike. Her wiha welatî di serî her mehekê de pereyên qezenckirine ji Komîteyê re vedigerînin.
Di derbarê vê mijarê de endamê Komîteya Aborî Heysem Mela armancên Komîteyê daxuyakirin û got:"Insyatîfa Komîteyê weke deyndan,ji bo alîkariya şêniyê Efrînê ku bi darê zorê ji warê xwe derkrtine û ji bo tunekirina bêkariya li herêma Şehbayê re hat".
Mela axaftina xwe wiha domand:" Ji ber ambargoya li ser herêmê, vekirina projeyên mezin zehmet e. Rexmî vê yekê jî bi beşdarbûna hejmarek malbat proje têne vekirin. Em dikarin bêjin ku zêdeyî 100 malbatî sûdê ji van projeyan digirin. Qezenciyên van projeyên dê li malbatan vegerin, li aliyekî din jî ev proje bê kariyê kêm dike."
Mele di berdewama axaftina xwe de, anî ziman ku wekî komîte li gorî derferên di destê Rêveberiya Xweseriya Demokratîk niha ji bo vekirina kargeha qeşa ango bûz dixebite. Kargeha ji 7 odeyên berad ji bo depokirina zebze û mêweyan pêk tê.







Ji aliyê xwe ve welatiyê bi navê Mustefa Golîn diyar kir ku komîte alîkariya wî kiriye û wiha got:" Piştî dagirkirina Efrînê xisarên mezin li aboriya me ket, em spasiya insyatîfa komîteyê dikin. ***ANHA***

## Kirîn û firotinê rêxistin dike



Li Tebqayê kirîn û firotina hemû cureyên madeyan ji aliyê rêveberiya gîştî ya gumrîkê tê bi rêve birin.
Rêveberiya korîdora sereke kirîn û firotina derve ya madeyên xwarinê û madeyên din ên ku pêwîstiya şêniyan bi wan heye bi rêxistin dike. Rêveberî alîkariyê dide kirînê û xebatê wê hêsan dike. Her wiha tevgera sûkan û karê firotina madeyên zêde dişopîne da ku tevgera kirîn û firotinê li zêde bibe.
Yek ji rêveberên Gumrika Tebqayê Marûf Osman destnîşan kir ku gelek made mîna dermanan û alîkariyê mirovahî gumrika wan nagirin. Osman got ku madeyên din mîna zebze, mêwe û madeyên xwarinê ji her tonekî re pereyên hindik digrin.
Her wiha hindeke made hene pêwîste ku di riya korîdorê re dernekevin dervî herêmê. Ev yek ji bo ku dema ew made li sûkê qut bibin bazirgan buhaya wan bilind nekin. Ew made jî semad û tov in. Elemeniyom û nehas her wiha genim û pembo heger yek ji bazirganan xwest yek ji van madeyan derxwe dervî bajar pêwîste ku fîza ji aliyên peywendîdar bigre.
Di vê demê de pirojeya avakirina komîteyeke hevbeş tê lêkolîn kirin. komîte ji endamên Mûdîriyeta Bazirganiyê, Mûdîriyeta Çandiniyê û komîteya Tendirûsiyê pêk tê. Ev proje bi armanca başkirina mekanîzmeya karê korîdorê û şopandina madeyên ku ji bajar derdikevin û tên bajar dê were ava kirin.
Rojane di nava 24 saetan de dewriyên şopandinê ji aliyê rêveberiya giştî ya korîdorê û Hêzên Ewlehiya Hundrîn derdikevin û ji bo ku qaçaxçî neyê kirin ew xet tê şopandin.
Heger tu made hatin girtin têne desteser kirin û heger ew made di nava medyên ku qedexekirî ne wê demê pere ji bazirganan tê xwestin.

## Niha Reqa arame û jiyan lê geş e

6'ê Hezîranê ji bo gelê Reqayê xwedî wateyeke girîng e, roja hezkirin, jiyaneke azad û serkeftina xêr li hemberî zulmê nîşan dide.
Şêniyên Reqayê çend salan di bin zilma çeteyan de man. Timî li bendê bûn ku Hêzên Sûriya Demokratîk wan ji zilma çeteyan rizgar bikin. Li ser vê yekê Hêzên Sûriya Demokratîk 6'ê Hezîrana par de Pêngava Rizgarkirina bajarê Reqayê ji çeteyan ragihandin û di 17'ê Cotmeha heman salê de bajar rizgar kirin. Taxa Meşleb ku beşê herî mezin di bajêr de ye yekem tax bû ku hat rizgarkirin.
Derbarê roja îlnakirina pêngava rizgarkirinê de şêniyên bajêr nêrînên xwe anîn ziman.
Qasim El-Hesen: Hemd ji xwedê re em ji çeteyên DAIŞ'ê xelas bûn, dema pêngava rizgarkirinê di 6'ê Hezîrana 2017'an de hate ragihandin, me deqe bi deqe, sanî bi sanî dijmartin da ku ji zilma çeteyan xelas bibin. Niha em azad in. Bi saya hevgirtina Ereb, Kurd û Suryan û Asur û hemû beşên civakê bajarê me roj bi roj geş û aram dibe.
Ebdulcelîl El-Hemûd: 6'ê Hezîranê roja kêfxweşiyê ye, ji ber ku di vê rojê de pêngava rizgarkirina bajar destpê kir. Kêfxweşiya me ya di wê demê de nedihat wesifandin, ji ber ku em ji kabûsa 4 salan xelas dibûn. Em spasiya QSD'ê dikin ku bajarê me rizgar kir, bi saya wan rewş aram bûye, em bi xwe, xwe bi rêve dibin.
Ehmed El-Salih: Çeteyên DAIŞ'ê azadiya me asteng kiribûn, di nava 4 salan de kiryarên herî hovane li ser me pêk anîn. Em bi hemleya rizgarkirinê ku hate ragihandin gelek kêfxweş bûn, sebra me nema bû em li benda roja rizgarkirinê bûn. QSD'ê wateyek nû da jiyana me, êdî em bi aramî dijîn..***ANHA***



## Xanên Cumayê çavkaniya nexweşiyan e



Xanên (Cihên lawir lê tên xwedîkirin) li taxa Cumeyê ya Qamişlo zêde ne, ev yek dibe sedema nexweşiyan. Xan di sala 1980'yî de li eraziyek vale dûrî bajar hatibûn çêkirin. Her ku bajar mezin bû mal li derdora xanan hatin avakirin. Ji salên 1990 ve mal li derdorê xanyan tên çêkirin. Bi vê re jî xeterî derketin holê. Êdî di taxa Cumeyê de mirov û lawir bi hev re jiyan dikin. Zêdehiyên lawiran (zibil û lawirên mirî) zererek mezin digihînin gelê taxê. Rêyên taxê bi ziblê û laşe lawiran, mêş û kelmêşan û bêhna nexweş tijî bûne. Ava baranê ya ku di çalan de kom dibe, bi demê re rengê kesk digire û mêşên cuda cuda hildigire. Li taxê 220 xan hene, di van xanan de 70 hezar dewar û pez tên xwedîkirin.
Li gor agahiyên ji Şaredariya Rojhilatê Qamişlo girt, xan erdê gel ên taybet in. Şaredarî nikare dest deyne ser. Her xanek nêzîkî 500 metre ye û şaredariyê diyar kir ku ew erdek ewqas mezin di destê wan de nîne ji bo xanan ji nava bajar derbixin.
Tevî hewlên şaredariyê ji bo paqijkirinê lê dîsa kêm dimîne û nabe çare.
Ji şêniyên taxê Xêriya Qasim (50) bêzariya xwe wiha anî ziman: "Ji ber mêş û bêhna nexweş em ranakevin. Em nikarin xwarinê danin pêşiya xwe. Mêhvanek tê em şerm dikin çayekî bidinê mêş dikevin nav de. Bila ev mêş bên derman kirin. Dest û rûyê me ji pizikan (heb) nayê xwiyan. Dema em nêzî taxê dibin ji ber bêhnê em dizanin hatin e taxê."
Welatiyê ji taxê Bavê Xazî jî diyar kir ku mêşa nexweşiya leşmanya ji avên pîs ên di taxê de çêdibin û wiha axivî: "Em nabêjin bila xanan rakin. Bila derman bikin û zibil paqij bikin."
Yekîtiya Bazirganên Sewalan a girêdayî Yekîtiya Odeyên Bazirganî û Pîşesaziya Qamişlo di 4'ê mehê de ji Şaredariya Rojhilat çend taleb xwestin û niha Gelê taxê li benda xistina meryetê ya Şaredarî û xwediyê xanan e…ANHA

## Parazvanê çandê Selah Osê ji nav me barkir

Hunermend Salah Osê (63) bi sibeha pêncşemê re çû ser dilovaniya xwe.
Hunermend Selah Osê di sala 1955'an de hatiye dinê. Ji şêniyên gundê Til Şeîr a navçeya Tirbespiyê ye kantona Qamişlo ye. Di malbatek oldar û welatparêz de Jiyana xwe ji bo pêşxistina folklore û çanda kurdî da.
Hunermend Selah Osê di nava civakê de ku sembola parastina çandê dihate naskirin. Di dikana xwe ya firotina alavên muzîkê ya bajarê Qamişlo de 35 salan xebitî.
Di hemû şahiyên Newrozê û şahiyên netewî de beşdar dibû.
Pir ji bajarê Qamişlo hez dikir. Ji gotinên wî yên bi nav û deng digot ku ew masiye û bajarê Qamişlo ave ew tê de iyan dike.
Wekî Cîgirê Hevserokê Yekîtiya Rewşenbîran hate hilbijartin. Bi nexweşiyek giran ket û li Başûrê Kurdistanê dihate dermankirin. Paşê vegeriya bajarê xwe Qamişlo. Hunermend Slah li gundê xwe spartin axê.

## Dibistanên şagirtên serkeftî

Piştî salek ji perwerdeyê encamên xwendekaran derektin, Komîteya Perwedeyê ya Meclîsa Sivîl a Reqayê 3 dibistan ji bo xwendekarên herî serkeftî vekir.
Komîteya Perwerdê di 27'ê gulana 2018'an de dibistan ji bo xwendekarên herî sekeftî vekiribû. Dibistan pêşwaziya 250 xwendekarên sekeftî kir.
3 dibistanên hatine vekirin ev in: Dibistana Rebîe El-Edewiya, Dibistana El-Farûq û Dibistana Cewad Enzûr.Bernameya dibistanan li gorî demsala havînê wiha ye: heftê 3 rojan wane tên dayîn. Her waneyek 2 saet in.Ji ber qutbûna xwendekaran ji xwendinê, bi mebesta dabeşkirina xwendekaran li gorî salên wan ên xwendinê û bi armanca tevlîbûna pêşbirkan li ser asta dibistanên bajêr û gundên wê ev gav hat avêtin.
Di derbarê vê mijarê de Berdevkê komîteya dibistanan Riyad El-Mirî destnîşan kir ku, xwendekarên Reqayê 4 salan ji fêrbûnê bê par mane û ji bo xurtkirina asta perwerdê û pêşxistina asta xwendekaran,ev dibistanên hatin destpêkirin.
El-Mirî diyar kir ku ew dixwazin navendek ji xwendekarên serkeftî li taxên rojhilata bajarê Reqayê bi taybet li Taxa El-Meşleb ava bikin.





# Li Hesekê "Firina Îştar" hat vekirin

***Komîteya Aborî ya Jinan li Hesekê bi navê Îştar Firinek vekir. Di vê firinê de wê sê jin bixebitin. Ji rêveberên Komîteya Aborî Hîvda Abdullah diyar kir ku ji bo ku jin xwe bi xwe kar û xebatê xwe bimeşînin wan ev firin vekiriye.***

Desteya Aborî li taxa Nasra ya bajarê Hesekê firinek taybet bi jinan bi navê Firina Îştar bi merasîmekê vekir.
Desteya Aborî bi armanca pêşxistina rola jinê û aboriya wê li bajarê Hesekê firIneke taybet bi jinan vekir. Di firinê de 3 jinên ku pereyên wan di vekirina firinê de hene dê bixebitin.
Bi dehan jinên bajarê Hesekê tevlî merasîma vekirina firinê bûn. Merasîm bi rêzgirtinê destpê kir. Paşê yek ji rêveberên Desteya Aborî Hêvda Abdullah axivî û vekirina firinê li hemû jinan pîroz kir û ev tişt anî ziman: "Ji bo ku jin xwe bi xwe kar û xebatê xwe bimeşîne me ev firin vekir."
Di dawiyê de deriyê firinê ji aliyê dayîka şehîd Mediya Îsa ve hate vekirin.







## Rêveberiya Xweser nimûneya çareseriyê ye

**Melek DEMÎRTAŞ**

Berdevka Eniya Demokratîk a Sûriyê Meys Kirêdî diyar kir ku projeya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk ji bo çareserkirina aloziya Sûriyê nimûne ye û pêdiviya Sûriyê bi danûstandineke Sûrî-Sûrî heye.
Şandeya Eniya Demokratîk a Sûriyê di 4'ê Hezîranê de bi armanca hevdîtin û pêkanîna diyalogan serdana Herêma Cizîrê kir. Şande di serdana xwe de bi gelek aliyên siyasî re hevdîtin kir.

### DÎVÊ ÇARESERÎ LÎ SÛRÎYÊ BE

Berdevka Eniya Demokratîk a Sûriyê Meys Kirêdî di destpêka axaftina xwe de armanca serdanên xwe ji bo Bakurê Sûriyeyê vegot: " Bajarê Qamişlo yek ji qadên siyasî yên herî ferehe di sûrî de, hatina me ya ji bo Bakurê Sûriyê avakirina peywendiyan di navbera Eniya Demokratîk a Sûriyê û hêzên siyasî yên Sûriyê de ye, her wiha ji bo naskirina kar û xebatên ku li herêmê têne meşandin e.
Meys da zanîn ku ew bi diyalogên Sûrî –Sûrî re ne û got , "Em bi hêvî ne ku hemû hêzên Sûrî, li ser masyekê diyalogan çêbikin da ku bighêjin encamekê ku xizmeta gelê Sûrî bike."



### NÎMÛNEYA ÇARESERÎYÊ YE

Meys bal kişand ser tecrûbeya Rêveberiay xweseriya Demokratîk û got: "Rastî ez nikarim bi kurahî ser biaxivim, lê projeya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk ji bo çareserkirina aloziya Sûriyê nimûne ye û pêdiviya Sûrî bi danûstandineke Sûrî-Sûrî heye. Her wiha ya ku bala min jî kişand rola jin, rêxistinkirin, ewlehî û tevgera siyasî ya rengereng bi hemû pêkhateyan re modeleke nû û serkeftî ye. Rastî em rexnedayînê xwe didin ku heya niha min serdana bajarekî wiha ku xwedî tevgerkî siyasî xurt û avaker nekiriye."
Meys Kirêdî da zanîn ku di encama serdana wê ji Cizîrê re xurtbûn, rol û rêxistinkirina jinan bala wê kişand û wiha domand: "Jinên Bakurê Sûrî taybet Rojava xwedî taybetmendiyek cûda ji herêmên din yên sûrî ne, di hemû qadên jiyanî, siyasî, leşkerî û diplomasî de pêşeng û xwedî biryarin. Her wiha tişta herî xweş û balkêş bû sitratîjiya Hevserokatî bû ku di her sazî û navendekê de hevserokatî hebû, ev tê wateya ku di hemû milan de edalet heye. Ev Rêxistin dikare hîn pêşketinên hişmendî ji gel re pêşkşê bike."

### ŞANDEYEK TAYBET JÎN WÊ SERDAN BÎKE

Berdevka Eniya Demokratîk a Sûriyê Meys Kirêdî dest nîşan kir ku ev tecrûbeyek dewlende û hevdîtinên xwe bi Rêveberiya Xweser re êrênî dibînin û wiha dawî li axaftina xwe anî: Di riya van hevdîtinan bawerim ku wê pêvajoyên nû ji bo Sûriyek demokratîk ava bibe. Ji ber tecrûbeya jin li Rojava di hemû qadan de mînake, di demên pêş de wê serdana jin taybet ji jinên Rojava re be."

## Werzîş bi jinê xweş dibe



Werzîşvanên jin di cîvaneke li Qamişlo de maknîzmeya çalakirina Fûtbola jinan gotubêjkirin, di civînê de rewş werzîşa jinan jî di rojevê de bû.

### DÊ TURNOVE WÊ HEBÎN

Di vê civînê de nûnerên Yekîtiya werzîş û yaneyan amede bûn . di civînê de birayar hate girtin ku Tûrnoveyên jinê bên lidarxistin, her wiha kopeya jinên Fûtbolê jî bê çêkirin. Ev biryar ji bo çalakirin û pêşveçûna qadên werzîşê taybet bi jinê gavek êrênî ye.

### 6 YANEYÊN JÎNÊ HENE

Tevî ku karê werzîşê di çarçoveya mêr de hatiye hêştin, li gorî merc û şertên li herêma Cizîrê û her wiha li gorî xwestekên civakî 6 yaneyên taybet bi jinê hene. Ev pêşketinên heyî jî bi riya saziyên mîna Yekîtiya Werzîş û Desteya Werzîşê ve tên rêxistinkirin û berfireh kirin.

### ŞAMPÎYONA YANEYA JÎNÊN QAMÎŞLO

Hêjayî bi bîrxistinê ye ku di dewreya bûrî de jinên yaneya Qamişlo û jinên yaneyan Ehlî Amûdî lîstin û yên Qamişlo biserketin. Her wiha di sla derbasbûyî de jî di şahiya salvgera Rêvebiriya Xweseriya Demokratî de Jinên Yaneya Qamişlo nasnameya şampyona jin wergirtin û hate ragihandin."***Ronahî/Qamişlo***

## jinên herî wêrek ên cîhanê

Golfishteh Farahani, yek ji lîstikvanên sînemaya Îranê yên li pêş e. Ew di filma Keçên Rojê de ku di Festîvala Filman a Cannesê ya 71'an de di beşa pêşbirkê de hat nîşandan, xwediyê rola sereke bû. Ew timî ji bo tişta ku jê bawer kir, têkoşiya. Hîna di temenê piçûk de li ber cudakeriya li dijî jinê rabû. Bi pozên tazî wê siyasetên zextê yên li dijî jinan protesto kirin. Ji ber wê jî cezayê îdamê lê hat birrîn. Farahanî niha sirgûn e li paytexta Fransayê Parîsê dijî. Ew ji bo vê dibêje, "Min welatê xwe ji dest da lê niha tevahiya dinyayê ya min e".

### DI 6 FÎLMÊN KURD DE LÎST

Golshifteh Farahani, di filma Behman Qûbadî ya bi navê "Nîvê Heyvê" de û di du filmên Hiner Salem de lîstiye û bi giştî di 6 filmên Kurdan de rol kiriye. Wekî din performansa wê ya di filma derhênerê derasayî Jim Jarmush a bi navê Paterson de têra xwe bal kişand ser xwe. Farahani herî dawî di filma derhênera Fransî, Eva Husson a bi navê Keçên Rojê de rola sereke kir, û ev film di li festîvala Cannesê hat nîşandan. Filma bi navê orîjînal "Girls Of The Sun" behsa şerê jinên Kurd li dijî DAIŞ´ê dike û tê de Golshifteh Farahani fermandara bi navê Behar e. Em pê re li ser filma wê û têkoşîna jinên Kurd peyivîn.

***Di filmê de tu şervaneke jin a Êzîdî bûyî. Vê hiseke çawa bi te re peyde kir?***

Kirina vê rolê bi rastî jî rûmeteke mezin bû ji bo min û li gorî wê ez bi berpirsiyarê rabûm. Ev jin, ew jin bûn ku êşkence li wan hatibû kirin, hatibûn firotin û rastî destavêtinê hatibûn. Lê ev jin xwe li mexdûrbûnê danaynin, têdikoşin. Jinên gelekî xurt in, ji ber wê berpirsiyarî diviya. Min hinekî jî xwe baş kir bi vê rolê.

***Di filmê de tu bi rola şervaneke jin radibî. Berê ti amadekarî yan jî lêkolîna te hebû gelo?***

Min dîroka Êzîdiyan beriya hingê jî nas dikir. Haya min ji pêşmergeyan jî hebû. Bi Hiner Salem re di dema girtina dîmenên filma "My Sweet Pepperland"ê ez li Kurdistanê bûm. Diviyabû ez fêrî zimanê Kurdî bibim. Jixwe min hinekî ji Kurdî fêm dikir, dişibiya Farisî. Psîkolojîk jî diviyabû ez xwe amade bikim.

***Di filmê de slogana "Jin jiyan azadî" heye, ji bo te ew çi îfade dike?***

Min pirr baş fêm dikir ka ez çi dibêjim. Ji bo jinê, ji bo azadiyê hêviyek e. Jina ku berê xwe daye jiyaneke mişt azad e ew. Ev ne tenê ji bo jinê, ji bo mêran û Kurdistanê jî wisa ye. "Ji bo jînê, bi azadi"… Navê çûkê di filmê de jî "azadî" ye.

***Karaktera Behar tu çi qasî nêzî xwe dibînî?***

Bê guman di navbera min û Beharê de gelek xal û xisletên hevpar hene. Ew xwe weke mexdûrekê nabîne, ez jî wisa. Her çendî, dinya bixwaze min weke mexdûrekê nîşan bide jî, min ev yek red kir. şervanek e. Ew keça rojê ye…***Alî Guler/ANF***

## Zeyneb Celaliyan rayedarên girtîgehê hişyar kir



Girtiya siyasî ya Kurd Zeyneb Celaliyan hişyarî da rayedarên girtîgehê ger ku heya roja Şemiyê neşînin nexweşxaneyê, wê nerazîbûnek cûda nîşan bide.
Rewşa tenduristiya girtiya siyasî ya Kurd Zeyneb Celaliyan ku li Girtîgeha bajarê Xoy ya girêdayî parêzgeha Urmiyê ya Rojhilatê Kurdistanê dimîne pir xerabe. Celaliyan bi nexweşiyên giran ên weke êşa dil, îltihaba diranan, tarîbûna çav û çend nexweşiyên din êşê dikişîne. Rayedarên girtîgehê jî destûr nadin ku Celaliyan ji bo tedawiyê biçe nexweşxaneyên derveyî girtîgehê.
Zeyneb Celaliyan par ji bo nîşandana nerazîbûna xwe ya li hemberî astengiyên li pêşiya dermankirina wê, dest bi greva nebikaranîna dermanan kir. Ev grev dewame. Her roja diçe rewşa Celaliyan hîn nebaştir dibe.
Pêşti rayedarên navenda tenduristiyê yên Girtîgeha Xoy bi nivîsekê daxwaz ji rayedarên girtîgehê kiribûn ku Celaliyan ji bo tedawiyê bişînin nexweşxaneyên derveyî girtîgehê. Lê rayedaran destûr nedane vê yekê.
Zeyneb Celaliyan hişyarî da rayedarên girtîgehê ku heya roja Şemiyê neşînin nexweşxaneyê, wê greva xwe ya ne karanîna dermanan ji bo çalakiyek cûdatir biguhere.
Zeyneb Celaliyan Di sala 2007'ê de li Kirmaşan ji aliyê hêzên rejîma Îranê ve hate girtin û hîna nehatiye berdan. Celaliyan ji ber endamtiya PJAK'ê tê tawanbar kirin.

# Tirkiye dixwaze Minbicê bide terorîstan

***Hevserokê Meclîsa Zagonsaz a Minbicê û Şêxê Eşîra El-Bobena Farûq El-Maşî diyar kir ku dewleta Tirk dixwaze li Sûriyê careke desthilatdariya Osmanî ava bike û da zanîn ku dagirkirina Efrînê mînaka vê yekê ye. El Maşî got, “Dema ku çeteyên***

Farûq El-Maşî destnîşan kir ku dewleta Tirk dixwaze careke din terorîstan vegerîne Minbicê û careke din dagirk bikin.

Hevserokê Meclîsa Zagonsaz a Minbicê û Şêxê Eşîra El-Bobena Farûq El-Maşî ji ANHA’yê re axivî û pêşketinên dawî gefên dewleta Tirk yên li ser Minbicê nirxand.

El Maşî diyar kir ku dewleta Tirk dixwaze li Sûriyê desthilatdariya Osmanî ava bike û got, Dagirkirina Efrînê mînaka vê yekê ye. Dewleta Tirk niha hewl dide demografiya herêmê biguherîne. Kesên ji Humis, Xota û gelek deverên din hatine û li şûna welatiyên resen ên Efrînê yên hatine koçberkirin, hatine bicihkirin.

El Maşî bi bîr xist, dema ku çeteyên DAIŞ’ê Minbic dagir kirin, Tirkiye li hemberî komkujiyên çeteyan ên li dijî welatiyên sivîl bêdeng m û wiha dewam kir, “Bi destpêkirina hemleya rizgarkirina Minbicê re Tirkiyê dest bi gefxwarinên xwe yên li dijî Meclîsa Leşkerî ya Minbicê kir. Ji ber vê yekê xuyaye ku dixwaze careke din komên terorîst vegerîne Minbicê û careke din wêranî û koçberiyê li bajar pêk bîne. Tirkiye dixwaze projeya DAIŞ’ê li herêmê temam bike. Çawa ku welatiyên Efrînê koçber kirin hewl dide heman senaryoyê li Minbicê jî pêk bîne. Dema min serdana Efrînê kir ez bûm şahidê destdirêjiyên dagirkeriya Tirkiyê. Artêşa Tirk li dijî welatiyên Efrînê hemû cûreyên çekan bikar anîn. Ji ber vê yekê em dikarin eşkere bêjin ku Tirkiye hewl dide di bin navên cûda de komên terorîst careke din vejîne.”

El Maşî bal kişand li ser rewşa rizgarkirina Minbicê û got, “Dema ku Meclîsa Leşkerî ya Minbicê hate avakirin, li rex wê Meclîsa Sivîl a Minbicê jî hate avakirin. Piştî ku Meclîsa Leşkerî ya Minbicê banga têkoşîna li dijî çeteyên DAIŞ’ê kir, Yekîneyên Parastina Gel/



Jin û gelek tabûrên di bin sîwana Hêzên Sûriya Demokratîk de banga Meclîsê bersivandin û berê xwe dan eniyên berxwedanê yên bajarê Minbicê û li rex ciwanên Minbicê beşdarî berxwedana rizgarkirinê bûn. Piştî ku van hêzan bajar rizgar kirin, di serî de YPG’ê û YPJ’ê bi awayekî fermî ji bajarê Minbicê vekişiyan û ewlehiya bajêr bi temamî radestî Meclîsa Leşkerî ya Minbicê kirin. Niha jî şêwermendên girêdayî YPG’ê ku şervanên Meclîsa Leşkerî ya Minbicê perwerde dikirin, ji Minbicê vekişiyan. Lê Tirkiye her tim hewl dide teliheviyan li Minbicê derbixîne. Lê welatiyên Minbicê planên Tirkiyê baş nas kirine.”

El Maşî da zanîn ku ti dijminahiya wan li dijî Tirkiyê tune lê ew li dijî siyaseta wan ya li ser Sûriyê û Minbicê ne û wiha axivî, “Şêwra di navbera Koalîsyona Navnetewî û Rêveberiya Minbicê de her tim berdewam e. Koalîsyona Navnetewî gelek caran di van demên dawî de serdana bajarê Minbicê kir. Dijminahiya me bi dewleta Tirkiyê re tune ye, lê belê em li dijî siyasetên AKP’ê û serkêşê wê Erdogan in, ku her tim gefan li bajarê Minbicê dixwe. Em bang li dewletên navnetewî dikin ku li hemberî komployên dewleta Tirk derbikevin.”

Hevserokê Meclîsa Zagonsaz a Minbicê Farûq El-Maşî di dawiyê de diyar kir ku Minbic mozaîka gelan e û wiha got, “tişta ku çeteyên DAIŞ’ê hilweşandiye em ji nû ve ava bikin. Bajarê Minbicê beşekî ji Sûriya hevgirtî ye. Em hewl didin lehiya xwîna welatiyên Sûriyê rawestînin.”

## Dagirkeriya Tirkiyê nayê qebûlkirin




KNK’ê têkildarî dagirkeriya Tirkiyê ya li ser Başûrê Kurdistanê daxuyaniyeke nivîskî weşand û diyar kir ku divê xelkê Bakurê Kurdistanê di van hilbijartinên 24’ê Hezîranê de derseke mezin bidin Erdogan û desthilata wan hilweşînin.Di daxuyaniya KNK’ê de ev tişt hatin diyarkirin: “Tayyîb Erdogan, bi piştevaniya eniya faşîst MHP û Ergenekonê dîsa dest bi lêdana dahola şer kiriye. Piştî dagiriya Efrînê niha jî berê artêşa xwe daye Başûrê Kurdistanê. Ev demeke dirêj e ku Erdogan digel hevçeperên xwe şerê dijî Kurd û Kurdistanê, ji bo xwe kiriye armanca sereke. Erdogan bi referansên dîroka dewleta Tirk ya antî Kurd û antî Kurdistan bi rê ketiye. Aqûbeta xwe ya şexsî û siyasî li ser rûxandina gelê Kurd program kiriye. Ji 2015’ê û vir ve hem li bakur, hem li başûr û hem jî li rojavayê Kurdistanê ji êrîşkarî û dagirkerîyê pê ve tiştekî nake. Ji bilî wêrankirina Sûra Amedê, Cizîr, Nisêbîn, Şirnex û Geverê, ji Cerablûsê heta Efrînê, ji Başîka heta Biradostê, artêşa xwe seferber kiriye ku ji bilî bakurê Kurdistanê, parçeyên din yên Kurdistanê jî fetih bike. Erdogan desthilatdariya xwe li ser gola xwînê ava kiriye û dixwaze deshilata xwe li ser behra xwînê bidomîne. Tirkiye di destê Erdogan da her diçe di nav krîz û kaosa polîtîk û ekonomîk da xerq dibe. Erdogan da ku xwe ji vê belayê jî xilas bike, hilbijartinên gelek lez û pêşwext îlan kir û di 24ê Hezîranê de hem ji bo serokkomariyê hem jî ji bo parlementoyê hilbijartin wê bêne kirin. Di vê hewaya hilbijartinan da Erdogan li garantîyekê digere ku dîsa bi dek û dolaban xwe bi ser bixe. Rêya herî rehet bo wî şerê dijî Kurd û Kurdistanê ye. Erdogan rijandina xwîna Kurdan ji bo xwe kiriye şerbeta serkeftina xwe ya siyasî. Erdogan dixwaze ji Herêmên Parastinê yên Medyayê ku di bin kontrola HPG’ê de ye, ber bi Başûrê Kurdistanê ve baskê dagîrîya dewleta Tirk fireh bike û li dora Kurdistanê ablûkakayê vehûne. Erdogan Qendîl ji bo xwe kiriye sembola zaferê. Erdogan bi vê hemleyê ve dixwaze di hilbijartinên 24’ê Hezîranê bo xwe garantîyekê pêk bîne.KNK bi giringî dixwaze bala hemû Kurd û Kurdistanîyan bikşîne ser vê bûyerê ku hişyardarîyeke bilind pêk bînin û di nav vî hewayê hilbijartinên 24’ê Hezîranê da nekevine xefleteKê.Kurd pêkve, ji başûr, rojhilat, bakur heta rojavaya Kurdistanê û li diasporayê divê vê plana Erdogan sivik negirin û di nav hewildanên bergîriyê de bin.

Bi taybetî parlemento û hukûmeta Herême Kurdistanê û her weha hukûmeta Bexdayê divê operasyona leşkerî ya dewleta Tirk ya li ser Başûrê Kurdistanê bi xurtî şermezar bikin û rê li ber bigirin.

Erdogan, piştî dagîrîya Efrînê ‘Operasyona Qendîlê’ ji bo xwe kiriye parolaya serkeftina hilbijartinên 24’ê Hezîranê. Lewma divê xelkê Bakurê Kurdistanê di van hilbijartinên 24’ê Hezîranê da derseke mezin bidin Erdogan û desthilata wan hilweşînin.”

## Minbicî wê derbarê xwe de biryar bidin

Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Minbic û Gundewarên wê helwesta xwe ya derbarê îtîfaqa Tirkiyê- Amerîka diyar kir û destnîşan kir ku îtîfaq rewşa Minbicê naguhere.

Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Minbic û Gundewarên wê derbarê pêşketinên dawî yên derbarê Minbicê de civînek lidar xist.

Di civînê de, endamên sazî û komîteyên rêveberiyê û komînan amade bûn.

Di civînê de Endamê Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Minbicê û Gundewarên wê Ferhad Şiblî axivî û got, “Me bi kerwanan şehîd da ta Minbic azad bû. Lihevkirinên ku têne kirin ne di aliyê siyasî de û ne jî leşkerî rewşa Minbicê naguhere, wê hemû biryarên di derbarê Minbicê de rêveberiya Minbicê bide.”



Ferhad Şibilî, anî ziman ku hin komên leşkerî yên girêdayî Mertala Firatê û hin siyasetmedar ên ku destekê ji dagirkeriya Tirkiyê digirin bi navê Minbicê di axivin û got, “Bi navê Minbicê di axivin û paşê li ser ka wê çi biriyarê derbarê Minbicê de bistînin bi hev dikevin. Ji nakokiyên wan diyar dibe ku rola wan di Minbicê de nîne, nikarin destwerdana di Minbicê de bikin. Li ser vê yekê gelê Minbicê di aliyê leşkerî de pişta xwe daye Meclîsa Leşkerî ya Minbicê.”

Ferhad Şibilî diyar kir ew piştgiriyê didin her îtîfaqên ku ewlekariya herêmê misoger dike û da zanîn ku Meclîsa Leşkerî ya Minbicê ji du salan ve herêmê diparêze û bersiva her êrîşan dide.

Şibilî diyar kir ku, Rêveberiya Sivîl a Minbicê wê wekî berê herêmê bi rêve bibe û destnîşan kir ku gotegotên dibêjin dê “Koalîsyona Niştimanî” jî beşdarî rêveberina bajêr bibe, di lihevkirinên herdu aliyan de nînin.



Endamê Rêvberiya Sivîl a Demokratîk a Minbic û Gundewarên wê, Ferhad Şiblî di dawiyê de got, “Rêveberiya Sivîl a Minbicê û Gundewarên wê, di dema ku Meclîsa Leşkerî hate avakirin, ew jî hate avakirin û roleke pir mezin di xizmeta civakê de lîst.”…*ANHA*

## Em amade ne biçin Şamê

Hikmet Hebîb destnîşan kir ku ew amade ne biçin Şamê û diyalogên niştîmanî li ser asta tevahî Sûriyê pêk bîn in.

Endamê Desteya Rêveber a Meclîsa Sûriya Demokratîk MSD’ê Hikmet Hebîb anî ziman ku serdana şandeyên ji Şamê hatine Bakurê Sûriyê erênî ne û da zanîn ku ew ji bo danûstandinên niştîmanî yên Sûriyê amade ne.

Hebîb wiha axivî: ″Em her tim ji danûstandinên siyasî re amade ne û têkiliya me bi hêzên niştîmanî yên Sûriyê re heye. Em dixwazin dawî li êşên li ser gelên Sûriyê tên were. Em dixwazin rêveberî û destûra Sûriyê were guhertin û her kes bighîje mafê xwe.”

Di berdewamiya axaftina xwe de Hebîb wiha got: ″Em amade ne ji bo çareserkirina aloziya Sûriyê biçin Şamê û her deverekê li Sûriyê û bi her kesî re bidin û bistîn in. Projeyeke me ya niştîmanî heye û em dikarin li ser esasê wê projeyê bi her kesî re nîqaş bikin.”

Têkildarî serdana şandeyên tên Bakurê Sûriyê Hebîb ev tişt anî ziman: ″Serdana şandeyên têne Bakurê Sûriyê erênî ye. Danûstandinên Niştîmanî yên di navbera gelê Sûriyê de dê ax û



gelê Suriyê biparêze. Kongreyên ku ji derve hatin lidarxistin têkçûn û nikarîbûn aloziya Sûriyê çareser bikin. Heta niha jî civaka navdewletî nikare aloziya Sûriyê çareser bike. “…*ANHA*



# Pêdivî bi kongreyeke netewî ya Sûriyê heye

***Eniya Demokratîk a Sûriyê ya Opozisyonê Hevserok û endamên Meclîsa Zagonsaz a kantona Cizîrê re hevdîtin pêk anîn. Di hevdîtinê de aloziya Sûriyê hat nirxandin û ji bo çareserkirina aloziya Sûriyê hat gotin ku divê gelên Sûriyê li paytexta Sûriyê Şamê li hevdû rûnin û nîqaş bikin. Her wiha hat destnîşan kirin ku pêdivî bi lidarxistina Kongreyeke Niştîmanî ya Sûriyê heye.***

Di hevdîtina Eniya Demokratîk a Suriyê ya Opozisyonê bi Rêveberiya Xweseriya Demokratîk re li hev civiyan. DI Hevdîtinê de hat gotin ku projeya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk ji bo çareserkirina aloziya Sûriyê nimûne ye.

Hevdîtinên şandeya Eniya Demokratîk a Sûriyê ya Oposizyonê li Bakurê Sûriyê bi partî û aliyên siyasî re didomin.

Eniya Demokratîk a Sûriyê ya Opozisyonê Hevserok û endamên Meclîsa Zagonsaz a kantona Cizîrê re hevdîtin kir. Hevdîtin li Navenda Meclîsa Zagonsaz li navçeya Amûdê pêkhat.

Sekreterê Giştî yê Eniya Demokratîk a Sûriyê Mehmûd Meriî, Berdevka Eniyê Meys Kiredî, endamên Eniyê û Serokê Partiya Sûrî ya Siberojê Fewzî Teqîdîn, endamê Eniyê Ebdulezîz Dawûd û Serokê Partiya Aştiyê ya Niştîmanî û endamê Eniyê Hanî El-Xurî weke şande serdana Meclîsa Zagonsaz a kantona Cizîrê kirin.

Şande ji alyê Hevserokên Meclîsa Zagonsaz a kantona Cizîrê Hekem



Xelo û Nezîre Gewriye, Cîgerê Serokê Meclîsa Rêveber Hisên Ezam, endamê Meclîsa Zagonsaz Abdulkerîm Siko û Berdevkê Komîteya Têkiliyên Derve yê Meclîsa Zagonsaz Kamûran Hisên ve hat pêşwazîkirin.

Di hevdîtinê de aloziya Sûriyê hat nirxandin û ji bo çareserkirina aloziya Sûriyê hat gotin ku divê gelê Sûrî li paytexta Sûriyê Şamê li hevdû rûnin û nîqaş bikin. Her wiha şandeyê diyar kir ku divê hemû hêzên derve ji xaka Sûriyê derkevin û ew dibin sedema ku aloziya Sûriyê kûrtir bibe.

Şandeyê di hevdîtine de destnîşan kir ku projeya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk ne mîna projeyên Oposizyona derve ye û ji bo çareserkirina aloziya Sûriyê nimûne ye.

Di dawiya hevdîtine de şandeya Eniya Demokratîk û nûnerên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk gihîştin encama ku pêdivî bi lidarxistina Kongreyekî Niştîmanî ya Sûriyê heye.

Têkildarî hevdîtinê Hevserokê Meclîsa Zagonsaz ê kantona Cizîrê Hekem Xelo destnîşan kir ku di hevdîtine de hatiye gotin ku ji bo aloziya Sûriyê çareser bibe pêdivî bi danûstnadineke niştîmanî a Sûrî-Sûrî heye û got:″ Pêşveçûnên li herêmê diqewimin pêdivî heye ku danûstandineke niştîmanî Sûrî bi hemû alî û hêzên Sûriyê heye. Me tecrûbeya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk bi Eniya Demokratîk a Sûriyê re nîqaş kir.″

## Leşker û polîsên dîlgirtî bang kirin



Polîs û leşkerên ji aliyê PKK’ê ve hêsîr hatine girtin bang li dewletê, partiyên siyasî û saziyên civaka sivîl kirin ku ji bo wan bikevin nava liv û tevgerê.

Hikumeta Tirk ku ji bo endamên MÎT’ê, leşker û polîsên dîlgirtî tiştekî nake, bi bombebarana bi balafirên şer gefê li jiyana wan dixwe. 9 polîs û leşkerên dîlgirtî dixwazin ji bo qedandina dîlgirtina wan hewl bê dayin.

Serokê Karên Cihêkariya Etnîkî ya li Derveyî Welat ê MÎT’ê Erhan Pekçetîn û Rêveberê Çavkaniyên Mirovan ê MÎT’ê Aydin Gunel 4’ê Tebaxa 2017’an li bajarokê Dûkanê yê Silêmaniyê bi operasyoneke taybet hatibûn girtin. Ji bilî van, 9 leşker û polîsên Tirk di destê PKK’ê de dîlgirtî ne. Leşker û polîsên dîlgirtî diyar kirin ku şer çareserî nîne, dewlet wan ji nedîtî ve tê û xeteriyê li ser jiyana wan çêdike.

**SEDAT SORGÛN**: Ez ji Erzîromê me. Min li Girtîgeha Tîpa F a Wanê leşkerî dikir. Dema ku çûm betlaneyê, 13’ê Tebaxê di kontrola rê ya gerîlayên PKK’ê de hatim girtin. Nêzî sê sal in li vir im. Heta niha kesek li me negeriya, kesî li me nepirsî. Kes xwedî li me derneket. Em dixwazin ew xwedî li me derkevin.

**UMÎT GICIR**: Ji Balikesîrê me. 21’ê Îlona 2016’an li cihekî navbera Colemêrg-Çelê di kontrola rê ya PKK’ê de dîl hatim girtin. Li jenderme ya navçeya Çelê dixebitim. Hîn du meh nebû bû ku li wir hatim wezîfedarkirin. Nû hatibûm Çelê. Em dixwazin tiştek ji bo me bê kirin. Em li bendê ne ku siyasî, saziyên civakî yên sivîl û rayedarên dewletê piştî du salan êdî ji bo me tiştekî bikin. Em ji malbatên xwe jî hêvî dikin ku ji bo me tiştekî bikin. Bila zanibin ku rewşa me baş e.

**SEMÎH OZBEY**: Ji Meletiyê me. 17’ê Îlona 2015’an dema ji Dersimê ji bo betlaneyê diçûm Meletiyê dîl hatim girtin. Em ji her kesî li hêviya alîkariyê ne. Sê sal in li vir im. Nizanim bê kes ji bo me hewl dide, lê çi ji destê kê tê em li bendê ne ku bikin.

ADÎL KABAKLI: Ji Osmaniyeyê me. Li aliyê Dersimê ji aliyê PKK’ê ve dîl hatim girtin. Nêzî sê sal in li vir im. Heta niha ji bo me tiştek nehatiye kirin. Ev sê sal in em li radyoyê guhdarî dikin, lê kes qala me nake. Navê me jî nayê bilêvkirin. Bendewariya me ji dewleta me ye. Em ji vir bang li hemûyan dikin. Çima ji bo me tiştek nayê kirin?

**MUSLUM ALTINTAŞ**: Ji Rihayê, Xelfetiyê me. 2’ê Cotmeha 2015’an li Dersimê hatim girtin. Heta niha, yanî 3’ê Hezîrana 2018’an ez di destê rêxistinê de me. Bang li rayedarên hikumetê û dewletê dikim. Em li bendê ne ku hem ji bo me hem jî ji bo malbatên me tiştekî bikin.

**MEVLÛT KAHVECÎ:** Ji Eskîşehîrê me. 21’ê Îlona 2016’an, dema ji bo çêkirina qeyda ezmûnê ji Çelê diçûm Colemêrgê dîl hatim girtin. Nêzî du sal in li vir im. Me hewldanek ji bo xwe nedît, dengekî ji bo me nebihîst.

**SEDAT YABALAK**: Ji Mersînê me. polîs im. Li Rihayê wezîfedar im. 28’ê Tîrmeha 2015’an dema ji Erzîromê diçûm Rihayê li ser rêya Amed-Licê hatim girtin û heta niha di destê PKK’ê de me. Ji vê derê bang li rayedarên dewletê dikim. Bila ji bo me êdî tiştekî bikin.

**SULEYMAN SÛNGÛR**: Ji Sêrtê me. Li Çewlikê leşkeriyê dikim. Li ser rêya Amed-Licê di kontrola rê ya PKK’ê de hatim girtin. Sê sal in girtî me. Haya min ji dayik, bav, ji kesekî min nîne. Em ji CHP, MHP, AKP, HDP’ê, ji hemû partiyên siyasî tiştekî hêvî dikin. Em jî aştiyê dixwazin, bila mirov nemirin. Em dixwazin bigihêjin malbatên xwe.

**HUSEYÎN** SARI: Ji Mereşê me. Li Sarikamiş a Qersê wezîfedar im. Çawişê pispor im. 13’ê Tebaxa 2015’an dema ji Sarikamiş a Qersê diçûm Mereşê hatim girtin. 16’ê Tebaxa 2015’an daweta min hebû. Demeke dirêj di ser re derbas bû, lê em nizanin bê ji bo me tiştek hatiye kirin yan na.

## Li dijî dagirkeriyê ‘Eniya Neteweyî’ hate avakirin



Nerazîbûna li êrîşên dewleta Tirk ên li ser Başûrê Kurdistanê zêde dibe. Li Silêmaniyê ‘Eniya Neteweyî ya li dijî dagirkeriyê’ hate ragihandin.

Gelek aktîvîst, alimên olî, parlamenter û nûnerên rêxistinên civakî yên sivîl li Hola Emnesoreke ya Silêmanî li hev civiyan û biryar dan ku li dijî dagirkeriya Tirk ‘Eniya Neteweyî’ ava bikin.

Civîn êvara 7’ê Hezîranê hate kirin û hate ragihandin ku li dijî êrîş û dagirkeriyê wê karê dîplomasiyê bê kirin û çalakî bên organîzekirin. Ji bo vê jî komîsyonek hate avakirin.

Di civînê de hate destnîşankirin ku ji bo çalakî tenê li herêmekê neyên kirin, li gelemperiya Başûrê Kurdistanê komîteyên ‘Eniya Neteweyî ya li dijî Dagirkeriyê’ bên avakirin. Hate gotin, bernameya çalakiyan wê piştî çend rojên din bê eşkerekirin.



### Dikuje lê dijminatiyê nake Hevkariyê dike lê xwe xayîn nabîne

Seydî MIHEMED

Dijminê bavan nabe dostê lawan; gotineke pêşiyane ku rastiya li ser rûyê erdê bi tecrûbeyên jiyanê hatiye ser zimên. doste lê dikuje, hevkare lê li piştê dide, hevale ger ku berjewendiyên wî hebe. Ev jî rastiya dagirkeriya Tirk û faşîma dewleteke ku li ser dijminatiya kurd hatiye avakirin.Xwe dost dibînin lê dibêjin kurd tunene, ger kurd jî tunebin wê demê pirsgirêka kurd tune.Niha serokê rêjîma Tirk Erdogan ku desthilata xwe bi hebûna kurdan ve girêdide derdikeve ser dikê û dibêje “kurd birayên me ne û pirsgirêka kurd tuneye”. Gelo ger pirsgirêk hebe wê çawa bibe û çawa be?Beriya çend rojan Erdogan li Amadê bû û dewrewên wiha dikirin, û digot: “welatê kurdan heye ew jî Tirkiye ye”. Lê kurdan tune dike tune dibîne, yên ku serî natewînin jî bi hemû rêbazan êrîşê dibe ser wan, dixe zîndanan, dikuje û cihûwarên wan tune dike, saziyên wan xira dike û tune dike.Rastiya faşîzma AKP wiha ye.dema em dibêjin faşîzma AKP’ê û dagirkeriya Dewleta Tirk em tenê behse Bakurê kurdistanê nakin, êdî ji dagirkerên li ser parçeyên din ên kurdistanê zêdetir, dewleta Tirk dijminatiya kurdan li tevahiya kurdistanê û heta li Ewrûpayê jî dike û faşîmê bi kar tîne.Tenê bûyerên nava salên dawî em bi bîra we bixin, rastiya dijminatiya dewleta Tirk li ber çava ne.Ji destek dayîna Daiş’ê di êrîşên li ser Kobanê bigre heta êrîşên li ser gund û bajarên bakurê kurdistanê.Hilweşandina Sûr, Cizîr, Nisêbîn, Silopî û Şêrnexê. Kesên ku bi destê dewletê li van deveran hatin qetilkirin ji dayîka Taybet ya ku heft rojan cenazeyê wê li kolanê hate hiştin û rê nehat dayîn ku were rakirin heta pitika bi navê Mîray gelek sivîl bi hovîtî hatin kuştin. Li vir jî disa digotin me tiştekî wiha nedîtiye ,nekiriye û nebihistiye, lê hemû dunyayê dît û bihist tenê qatilan nebihist.Li başûr kurdistanê jî rewş ne Cûda ye. Li başûr aşiqên kujerên xwe derdikevin Holê. Gund têne bombebaran kirin, rûxandin û wêran kirin. gundî bi balefiran têne kuştin lê yek hewlest li dijî van êrîşan dernakeve û heta hincetên ku ew li dijî PKK’ê bombebaranê pêk tînin tên ziman.

Ger Dagirkerî û êrişên li ser başûrê kurdistanê ji ber PKK’ê be, ma gef û êrişên li dijî referandûma serxwebûnê ku dihate gotin jî ji ber PKK’ê bû ku bi rojan artêşa dagirker tetbîqatên leşkerî li ser sînor dikirin û hazirtiyên êrîşê li ser herêma Kurdistanê dikir.Lê sed heyf û mixabin tevî van hemû êrîşan jî li başûrê Kurdistanê li dijî dagirkeriyê helwest neguherî, û teslîmbûn didome. Li rojavayê Kurdistanê jî aliyên xwe kurd û Kurdistanî dibînin û xwe wiha bi nav dikin jî sîxurtiya dewleta Tirk dikin û vê yekê didomînin.Êrîşa herî dawî ya li ser Efrînê û qetilkirin bi sedan jin, zarok, kal û pîr, bombebarana bê ser û ber jî ger ne hovîtî, dijminatî û qirkirin be çiye?Ev tenê bûyerên sê salên dawî, komkujî û ji kiryarên dewleta Tirk li ser kurdistanê ne ku me bi kurtahî bi bîr xistin.Kesên ku hê jî hêviyê ji dewleta Tirk dikin û li benda wê ne ku di mijara kurdîtiyê de alîkariya wan bike ne tenê xwe dixapînin, mirov dikar bibêje ew kor in û nabînin jî. Yanî, yên heta niha hevkariyê bi dewleta Tirk re dikin ji bo wan kurtêlxur û xayîn jî bê gotin ne şaşe. Dijminatî wiha tê kirin û xiyanet jî li ber çavan e.